سوريون من أجل الحقيقة والعدالة
Syrians For Truth & Justice

# Daxuyanîyeke Hevbeş Der Barê Bûyerên Dawî li Dêra Zorê




Îlon, 2023

# Daxuyanîyeke Hevbeş Der Barê Bûyerên Dawî li Dêra Zorê

*Rêxistinên li ser daxuyanîyê îmze kirine, doza parastina sivîlan û çareserkirina koka sedemên nakokîyên dawî dikin*

Di 27ê Tebaxa 2023yan de, Hêzên Sûrîyaya Demokratîk (QSD) destpêkirina operasyoneke ewlekarî li Dêra Zorê bi navê "Xurtkirina Ewlehîyê" bi daxuyanîyekê li ser malpera xwe ya fermî ragihand. Daxuyanîyê armancên operasyonê destnîşan kirin û tê de hate gotin: "**Ev operasyon – bi armancên taybet – berfirehkirina operasyonên berê yên li herêma Cizîr û Reqqayê ye; ji bo têkbirina şaneyên DAIŞ'ê, pêşîgirtina li operasyonên wan ên gengaz û şopandina sûcdarên ku neheqî li xelkên sivîl kirine, her wiha ji bo şopandina qaçaxçîyên ku debara jîyana xelkê xistine bazarê jî hatiye destpêkirin.**"

Piştî vê daxuyanîyê, biryarek di 30ê tebaxa 2023yan de derket, Hêzên Sûrîyaya Demokratîk (QSD) tê de bidûrxistina serokê Encumena Leşkerî ya Dêra Zorê (Ehmed El-Xebîl/ Ebû Xewla) ragihand. Li gor biryarê, girtina wî xwe spart fermana Dozgerîya Giştî ya Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê.

Di rojên pêşîn ên operasyona "Xurtkirina Ewlehîyê" de, şer di navbera endamên Encumena Dera Zorê ya Leşkerî û hêzên operasyonê de rû da. Meydana vî şerî li hejmareke bajarok û gundên gundewarê bakurê Dêra Zorê, mîna bajarokê Bisêrayê bû, paşê berfirehtir bû û gihaşte herêmên gundewarê rojhilatî mîna bajarokên Zîban û Şihêlê.

Bi sedan endamên çekdar ên êl û eşîran tev li qadên kêferatê bûn, hejmareke kesayetên eşîran teqez kir ku çekdarên eşîran berevanîyê di ber Encumena Dêra Zorê ya Leşkerî û Serokê wê Ehmed El-Xebîl de nakin, lê daxwazên wan ên taybet hene, mîna mafê wan yê parastina ewlehîya herêmên wan.

Di rojên borî de, serkirde û rûspîyên eşîran, çalakîvanên civaka sivîl û rewşenbîran hejmareke daxuyanî da. Ji bo parastina sivîlan, di van daxuyanîyan de teqezî li ser giringîya rawestandina şer hat kirin, her wiha encamên neyênî yên mirovî û ewlekarî yên di berdewamîya şer de li ba sivîlan peyda dibin jî hatin dîyarkirin. Hevpeymanîya Navdewletî bi Serkirdayetîya Dugelên Yekbûyî yên Amerîkayê jî daxuyanîyek di 1ê îlona 2023yan de belav kir û doza rawestandina şer li Dêra Zorê kir.

Rewşa heyî bû sedema kuştin û birîndarkirina hejmareke sivîlan, gelek rêyên sereke yên diçin Dêra Zorê hatin girtin û bi berdewamîya vî şerî gef li kêmbûna kelûpelên sereke jî tê xwarin. Ev yek di heman demê de rê li ber hewldanên hin grûpan vekir ku êstgehên avê û nexweşxaneyan bikin armanc û derfet da hin grûpên din ku nearamîyê belav bikin û pêkhateyên Bakurrojhilatê Sûrîyayê ji hev dûr bixin.

Rêxistinên îmzeker doza agirbesteke demlidest ji hemû alîyan dikin û ji bo vegerandina aramîyê li parêzgeha Dêra Zorê bi rêya danûstendinên yekser di nav alîyên pêwendîdar de bang dikin. Dezgehên ragihandinê yên ku hewl dan şer weke şerekî "Kurdî-Erebî" dîyar bikin jî ji alîyê rêxistinan ve hatin şermezarkirin, her wiha doza rawestandina çi dezgehên ragihandinê yên li dij çi pêkhateyên li Sûrîyayê hat kirin.

Rêxistinên îmzeker parastina sivîlan weke armanceke pêşikî destnîşan dikin û banga cezakirina hemû alîyên pêwendîdarî binpêkirinên der heqê sivîlan jî dikin. Dawazên wan ji bo van alîyan ev in:

<u>**Yekem: Hêzên Sûrîyaya Demokratîk û Hevpeymanîya Navdewletî:**</u>

1. Divê bi awayekî lezgîn kelûpelên sereke li hemû herêmên Dêra Zorê yên ku ziyan ji ber bûyerên dawî dîtine werin peydakirin. Pêwîst e avahîyên giştî werin bêalîkirin. Divê garantî ji bo gihaştina alîkarîyên mirovî û hesankirina tevgera rêxistinên hawarçûnê bo gihandina alîkarîyan ji kesên ziyanxwarî re jî were dayîn.

2. Divê ji bo van bûyerên dawî yên li hemî herêmên Dêra Zorê yên der barê armanckirina sivîlan de lêpirsîneke zelal û bêalî pêk were. Ev yek divê bi rêya damezrandina komîteyeke qanûnî ya serbixwe bigihêje serî, da ku dadmendî bo hemû qurbanan were dabînkirin.

**Dûyem: Rêveberîya Xweser û Encumena Sûrîyaya Demokratîk:**

1. Pêwîst e yekser daxwazên navxweyî yên beşdarîya çalak a xelkên herêmê di rêveberîya ewlekarî û sivîlane de werin gengeşekirin. Ev yek divê bi rêya danûstandina li gel nûnerên civaka navxweyî pêk were; ji rûspîyê eşîran bigire, heya rêxistinên civaka sivîl, rewşenbîr û kesayetên serbixwe, her wiha hevkarîya li gel serkirdeyên navxweyî bo bijartina nûnerên guncaw di rêveberîya ewlekarî û sivîl de.
2. Ji bo tu binpêkirin der heqê sivîlan de neyê kirin û tu kes ji sizayê nefilite, divê mekanîzmeyên çavdêrî û cezakirinê werin pejirandin. Pêwîst e ev tişt bi rêya danîna kesayetên guncaw di nava desteyên çavdêrîya navxweyî de pêk were, her wiha bi standina şêwirmendîya nûnerên civaka navxweyî û rêxistinên civaka sivîl.

**Sêyem: Nûnerên civaka navxweyî ji serkirdeyên eşîran, rêxistinên civaka sivîl, rewşenbîr û kesayetên serbixwe:**

1. Ji bo beşdarkirina serkirdeyên sivîl û çalakîvanên civaka sivîl bi armanca ku bigihêjin nerîneke giştgir der barê birêvebirina ewlekarî û sivîl ya herêmê de, divê civaka navxweyî ya li Dêra Zorê li hev rûne û li hev bişêwire.
2. Ji bo daxwazên xelkên deverê yên girêdayî beşdarîya wan di revebirina ewlekarî û ya sivîl da bêne bicihanîn, divê danûstandin li gel Hêzên Sûrîyaya Demokratîk û Hevpeymanîya Navdewletî werin destpêkirin.

**Rêxistinên Îmzeker:**

1. Amal for development
2. Analysis and Strategic Studies Organization (ASO)
3. anwar algad
4. Ashna for development
5. Awda for development
6. Baytna
7. Better Tomorrow organization
8. Bridges of peace for development
9. C.D.R
10. Center for Civil Society and Democracy /CCSD
11. coalition of civil society organizations in north east Syria
12. Community Solidarity Organization
13. Country Raqqa Organization
14. DAR Association for Victims of Forced Displacement
15. Deirna organization
16. Ella Organization For Development and Peacebuilding
17. Ensaf for development
18. Eridu center for civil society and democracy
19. Euphrates NGO
20. Fajr
21. For Them Organisation
22. ForFeminist

23. Future Makers Team
24. Hamzet wasel
25. Haneen.alfurat
26. HDF Humanitarian
27. HLOM
28. Human Organization for Construction and Development
29. Jasmine Association
30. Justice for Life
31. Medical Relief for Syria
32. PÊL- Civil Waves
33. Qadar Organization
34. Rose organization for support and empowerment
35. Sahem Organization for Cooperation and Development
36. SALAM organization
37. Share for Community Develooment
38. Shawshaka Association for Women
39. Swaedna Organization for Relief and Development
40. Synergy Association for Victims
41. Syriac Strategic Research Centre
42. Syrian Forum
43. Syrians for Truth and Justice - STJ
44. Tal-Abiyad Forum for civil society
45. Tara Organisation
46. Tayif Humanitarian Organization
47. The Day After
48. Together For Deir Ezzor
49. TOTOL Foundation
50. Urnammu for Justice & human rights
51. Youth for change
52. Zameen for development and peacebuilding
53. Zorna Organization for Development

سوريون من أجل الحقيقة والعدالة
Syrians For Truth & Justice

## About Us:

Syrians for Truth and Justice (STJ) is a nonprofit, nongovernmental organization monitoring human rights violations in Syria. Founded in 2015, STJ has been based in France since 2019.

STJ is an impartial and independent Syrian human rights organization operating across Syria. Our network of field researchers monitor and report human rights violations occurring on the ground in Syria, while our international team of human rights experts, lawyers, and journalists gather evidence, examine emerging patterns of violations, and analyze how violations break domestic Syrian and international law.

We are committed to documenting violations of human rights committed by all parties in the Syrian conflict and elevating the voices of all Syrians victimized by human rights violations, regardless of their ethnicity, religion, political affiliation, class, and/or gender. Our commitment to human rights monitoring is founded on the idea that professional human rights documentation meeting international standards is the first step to uncovering the truth and achieving justice in Syria.

WWW.STJ-SY.ORG

STJ_SYRIA_ENG

EDITOR@STJ-SY.ORG